Ronahî
şopdara rastiyê ye
Hejmar : 399 nameronahi@gmail.com 22 - Hezîran - 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

# Koçber di bin şertên zehmet de dijîn

**_Bi hatina havînê û zêdebûna germê re koçberên li kampên bakurê Sûriyê di bin şert û mercên zehmet de dijîn. Niha li kampên bakurê Sûriyê bi deh hezaran koçberên Sûriyê û Iraqê hene. Şêniyên kampa Eyn Îsa jî bang li saziyên navnetewî kirin ku alîkariya wan bikin._**



Ji sedî 50 çadirên kampa Eyn Îsa ji ber rewşa hewayê riziyan. Koçberên kampê banga alîkariyê dikin. Her wiha rêveberî hewl dide vê pirsgirêkê çareser bike lê rêxistinên mirovî rewşa kampê paşguh kirine.
Di kampa navçeya Eyn Îsa ya girêdayî kantona Girê Spî de nêzî 13 hezar koçberên ji hemû bajarên Sûriyê û Iraqê dijîn. Koçber li ser 2 hezar û 700 çadirên biçûk belav dibin. Di demên dawîn de ji ber rewşa hewa nêzî hezar û 300 çadir riziyan.
Ji ber zêdebûna germahiyê ji sedî 50 çadirên koçberên kampê zirar dîtiye. Ji ber ku çadir ji qûmaş in, baş nehatine çêkirin. Ji ber vê yekê bi sedan malbat bê cih û war mane.
Nêzî 750 çadir dibe ku werin sererast kirin, her wiha 550 çadirên din bi temamî riziyane û êdî nema tên bikaranîn.
Di vê çarçoveyê Lûeyî El-Selama û Xalid El-Elî ku di kampê de dimînin, destnîşan kir ku wan hêviyên xwe ji saziyên alîkariyê qut kirin û dest bi sererastkirina çadirên xwe kirin da ku xwe ji tavê biparêzin. Her wiha destnîşan kirin ku çadirên ku di her çadireke neriziya de 2 malbat dijîn.
Her du koçberan bang li rêveberiya kampê û rêxistinên alîkariyê kirin da ku di demeke nêz de alîkariya wan bikin û rewşa wan di ber çavan re derbas bikin.



Hevserokê Komîteya Kampê yê navçeya Eyn Îsa Celal El-Eyaf jî diyar kir ku wan 550 çadir ji koçberan re peyda kirine û wê di hefteya li pêş me li wan belav bikin. El-Eyaf di axaftina xwe de da zanîn ku hemû rêxistinên mirovî rewşa kampê û koçberan paşguh kirine...***ANHA***

# Êzidiyên li kampan li benda alîkariyê ne



Êzidiyên li kampa Şêxan dimînin, di şert û mercên zehmet de dijîn. Çadirên malbatên Êzidî hemû qetiyane û li benda alîkariyê ne.
Piştî êrîşên çeteyên DAIŞ'Ê li ser Şengalê, bi deh hezaran kes neçar man koçber bibin. Gelek ji wan derbazî Herêma Kurdistanê bûn. Wargeha Şêxan yek ji wargehên ku koçberên Êzidî têdene. Di



wargeha Şêxan de zêdetirî 800 malbatên Êzidî hene. Êzidiyên di wargehê de di nava şert û mercên zehmet de dijîn. Ev çar sale hê jî piranî malbat bê çadirin. Di zivistanê de li ber sermayê ne û havînê jî li ber germê ne.
Çadirên malbatên di wargehê de dijîn qediyane, di nava şert û mercên zor de dijîn. Ceyran jî li ser wan hatiye qutkirin.
Çavkaniyeke taybet ê ku nexwest navê xwe eşkere bike ku di nava kampê de dijî, diyar kir hîna jî ti daxwazên wan nehatine çareserkirin û wiha got; "Ev 10 mehe Amîr Ebo Elyas ku rêveberê bajarokê Mihetê yê ser bi parêzgeha Dihokê ve ye, çûye ji dervey welat û gel wisa hiştiye. Berdevkê rêveber yê binavê Ferhat Ehmed ku eslê xwe Ertuşiye ketiye şûna wî. Ehmed nikare tu karan bi rêve bibe û ji dema Remezanê ve serdana wargehê nekiriye."
Çavkaniyê anî ziman ku wan gelek caran xwestiye çadirên wan bên nûkirin, lê destûr nehat dayîn, çadirên ku hatine hemû di hewşa rêveberiya wargehê de hatine danîn û nadin gel.
Li gorî agahiyên ji nava wargehê hatîn girtin her roja diçe rewşa penaberên Êzidî di nava wargehê de ber bi xirabbûnê ve diçe.
Wargeha Şêxan dema çeteyên DAIŞ'ê êrîşê Şengalê kirin, ji bo penaberên Êzidî hatiye ava kirin. Şêxan girêdayî parêzgeha Dihokê ye...***ROJNEWS***

# Konferansa Travmaya Derûnî hat lidarxistin

1'emîn Konferansa Travmaya Derûnî ya ku li Silêmaniyê li ser bandoriya şer, li Başûrê Kurdistanê, Rojavayê Kurdistanê û rewşa penaberan hat lidarxistin, bi dawî bû.
1'emîn Konferansa Travmaya Derûnî 19'ê Hezîranê li Hola Rêxistina Pêşketina Civakî ya bajarê Silêmaniyê destpê kir. Konferans di roja duyemîn de bi dawî bû.
konferens ji aliyê Rêxsitina Bijîşkên Derûnnas ên Bêsînor hat organîze kirin. Konferans bi beşdariya zêdeyî 50 delegeyên ji bijîşkên derûnî, civaknas û lêkolerîneran pêkhat. Bijîşkên ji Başûr û Rojavayê Kurdistanê û bijîşkên Hollandî beşdar bûn.
Di roj 2'yemîn a Konferensa Travmaya Derûnî de li ser sê mijara nirxandin hatin kirin, Tavmaya Derûnî ji aliyê Derûnînas Dr. Nizar Mihemed ve hat nirxandin. Dr. Neşmil Resul jî rewşa jinên koçber ên Rojavayê Kurdistanê nirxand.



Di konferansê de ev biryar hatin girtin.
– Avakirina têkiliyan di navbera rêxistinên derûnî yên li Kurdistanê û ji derveyî Kurdistan û welatê Holandayê re.
- Avakirina têkiliyan di navbera beşên zanîngehên tenduristiyê de.
-Pêwîste cihek weke navendek ji bo tedawîkirina wan kesên ku rastî travmayên derûnî hatine were vekirin.
- Pêwîste saziyên derûnî ji bo penaberên Rojavayê Kurdistan yên li Herêma Kurdistanê dimînin alîkarî û piştgiriyê bikin.
- Pêwîste kar bê kirin ji bo her du sal carekê Konferansa Travmaya Derûnî were lidarxistin.

## NPG'ê gerîlayên Eyaleta Cîlo pîroz kir

***Fermandariya Biryargeha Navenda Parastina Gel NPG'ê, ji ber çalakiyên gerîla yên 18'ê Hezîranê yên li Colemêrgê gerîlayên eyaleta Cilo pîroz kir.***



Di peyamê de hate gotin, "Çalakiya 18'ê Hezîranê li qada Kani Orê ya li ser rêya navçeya Çelê ya Colemêrgê li dijî konvoya leşkerî hate kirin û derbên giran li hêzên dagirker mêtinger hate xistin, çalakiyeke serketî ye. Heman rojê li dijî yekîneya taybet a ji qereqola Gemanê ya li Çelê çalakiya sabotajê hate kirin. Di vê çalakiyê de derbên giran li hêzên dagirker hatin xistin. Em fermandariya we û hemû fermandar û şervanên tevlî herdu çalakiyan bûne pîroz dikin. ***R-2***

## Pêkane AKP di 24'ê hezîranê de têk biçe

Hevserokê Konseya Rêveber a KCK'ê Cemîl Bayik diyar kir ku pêkan buye AKP di 24'ê hezîrnaê de têk biçe. Bayik wiha got, "AKP ketiye nava pêvajoyeke têk çûnê. Lê belê AKP naxwaze bi hilbijartinê dest ji desthilatdariyê berde. Mirovên ku dixwazin ji AKP'ê rizgar bibin hê bi biryar xuya dikin. Ger ev hêz li sandoqan xwedî derkevin mirov dikare bêje ku wê dawî li desthilatiya AKP'ê were." ***R-4***



Ronahî
şopdara rastiyê ye
nameronahi@gmail.com Hejmar : 399 22- Hezîran - 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

## Çîrokek ji Babê ber bi çiyayan ve



Gerîlla Gulbahar Botan ya ku ji Babê niha li çiyayên Kurdistanê li dijî artêşa Tirk a dagirker şer dike.
Gulbahar dibêje, "piştî çeteyên El Nûsra ku bi piştgiriya dewleta Tirk zilm li me dikirin min biryar da ez beşdarî nava refên gêrîlla bibim. Bi tevlêbûnê min biryareke rast da." ***R-3***

## Erdogan ji bo hemû rojhilatanavîn xeter e



Sekrêterê Partiya Çepgir a Kurd Salih Gedo diyar kir ku dewleta Tirk li başûr, bakur û rojava bi her awayî êrîşî îrade û deskeftiyên gelê Kurd dike û bang li hêzên navnetewî kir ku li hember van êrîşan bibin xwedî helwest. Gedo got, "Di 24'ê hezîranê de têkçûna Erdogan wê ji bo gelên Rojhilatanavîn bibe nefesek." ***R-4***

## Gelê Babê bang li QSD`ê dike



Li Babê ku ji aliyê dewleta Tirk û çeteyên wê de hatiye dagirkirin kiryarên çeteyan û leşkerên Tirk roj bi roj zêde dibin. Her roj kuştin, talan, dizî û hwd, dewam dike. Gelê Babê yê ku ji van kirinan bêzar buye bang li QSD'ê dikin ku wan ji bin dagirkeriyê rizgar bike. ***R-5***

## Bêdengiya li tecrîdê sûcê mirovahiyê ye



Çalakî û nerazîbûnên li dijî tecrîda giran ya li ser rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan dewam dikin. Tevgera Azadiya Jinên Êzidî (TAJÊ) têkildarî tecrîda giran a li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan li Şengalê daxuyanî da û got, "Tecrîda giran ya li ser Rêber Ocalan divê tavilê rabe." ***R-3***

## Ji bo azadiya Ocalan wê nobedê bigirin

Dîwana Hevseroktiyê ya Kongreya Civaka Demokratîk a Kurdistaniyên li Ewropayê (KCDK-E) bi daxuyaniyeke nivîskî diyar kir ku Hevserokên KCDK-E'yê û hemû komeleyên bin banê wê di 25'ê Hezîranê wê tevlî çalakiya nobetê ya 'Ji Ocalan re azadî' ya li Strasboûrgê bibin. ***R-4***

# ÇETEYAN DOKTOR KUŞT GEL RABÛ SER PIYAN

## LI EFRÎNÊ WÊRANKIRIN DIDOME

Dewleta Tirk ku Efrîn dagirkiriye di kiryarên xwe yên dermirovî de sînoran nas nake. Her roj mirovan direvînin û li miqabilî wan bi hezaran dolar dixwazin û hinekan jî dikujin. Her roj mal û milkên gel talan dikin û didizin. Ji aliyê din ve jî bi lez û bez demografya herêmê diguherînin.

## GEL ÇETEYAN NAXWAZE

Gelê Efrînê li dijî kiryarên hovane yên leşkerên Tirk û çeteyên wê bêzar buye. Çeteyên dewleta Tirk yên navê OSO li wan kiriye, li Efrînê doktorek qetil kirin. Gelê Efrînê li hember vê yekê daketin qadan û bi duruşmeyên "em çeteyên qatil naxwazin" li dijî çeteyan xwepêşandan pêk anîn. ***R-5***



## Bi hezaran li dijî dagirkeriyê meşiyan

Li çar aliyên Kurdistanê nerazîbûnên li dijî êrîş û dagirkeriya dewleta Tirk zêde dibin. Gelê Amûdê li dijî êrîşên dewleta Tirk yên li ser başûrê Kurdistanê meşeke girseyî lidarxistin. Di meşê de hat diyar kirin ku gelê Kurd wê li hember êrîşan li ber xwe bide û dawî li dîkatatoriya Erdogan bîne. ***R-2***





## Kongreya Star ji bo Efrînê bang kir



Komîteyên Têkiliyên Dîplomasî yên Kongreya Star yên li bajarên Hesekê û Dêrikê û her wiha hin nûnerên rêxistinên jinan daxuyanî dan ji saziyên navnetewî xwestin ku komîteyeke wergirtina rastiyan û lêpirsînê li Efrînê ava bikin da ku rewşa welatiyên Efrînê û kiryarên li dijî welatiyan bêne eşkerekirin. ***R-2***

## Ciwanên bakurê Sûriyê berê xwe dan başûrê Kurdistanê



Bi sedan ciwanên bakurê Sûriyê di çarçoveya pêngava "serî hilde" de ji bo ku li dijî dagirkeriya dewleta Tirk derbasî başûrê Kurdistanê bibin berê xwe dan Sêmalka. Ciwanan diyar kirin ku weke ciwanên kurd li dijî dagirkeriyê çi bikeve ser milên wan ew ê bi cih bînin. ***R-2***

## 6 leşkerên Tirk hatin kuştin



Gerîla li bakur û başûrê Kurdistanê bi çalakiyên bi bondor derbên giran li artêşa Tirk a dagirker dide. Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê bi daxuyaniyekê diyar kir ku di encama çalakiyên hêzên wan yên li Dêrsim û Colemêrgê 6 leşkerên Tirk hatine kuştin. ***R-2***

## Bi derewên Erdogan neyên xapandin

Rûspiyên êl û eşîrên Kurdan ên kantona Kobanê bang li gelê Kurd û hêzên azadîxwaz ên Bakurê Kurdistanê û Tirkiyê kirin ku di hilbijartinên 24'ê hizêranê de dengên xwe bidin HDP'ê û bi propagandayên derew ên Erdogan neyên xapandin. ***R-4***

# Bi hezaran li dijî dagirkeriyê meşiyan

***Li çar aliyên Kurdistanê nerazîbûnên li dijî êrîş û dagirkeriya dewleta Tirk zêde dibin. Gelê Amûdê li dijî êrîşên dewleta Tirk yên li ser başûrê Kurdistanê meşeke girseyî lidarxistin. Di meşê de hat diyar kirin ku gelê Kurd wê li hember êrîşan li ber xwe bide û dawî li dîkatatoriya Erdogan bîne.***




Şêniyên bajarê Amûde êrîşên li ser başûrê Kurdistanê şermezar kirin û bi dirûşma 'Êdî bese ji dagirkeriyê re, bijî berxwedana gelê me' meşek li dar xist.
Li bajarê Amûde meclisên TEV-DEM û Kongreya Star ji bo piştgiriya berxwedana gelê başûrê Kurdistanê û şermezarkirina êrîşên dewleta tirk meşeke girseyî li dar xist. Meş li Qada Şehîd Cîhad bi deqeyek rêzgirtinê dest pê kir.
Di meşê de wêneyên Rebêrê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, alên YPJ/YPG hate hildan.
Meşê heya Navenda Ciwanan dewam kir û li wir vegeriya mîtîngê.
Di mîtîngê de hevseroka kantona Qamişlo Pervîn Yûsif axivî û diyar kir ku çawa li Efrînê li ber xwe dan, dê li Başûr jî li ber xwe bidin û got: "Dagirkeriya dewleta tirk berê xwe daye başûrê Kurdistanê. Bila baş zanibin ku em bi gelê Başûr re ne. Em ji berxwedana xwe gavekê paşde naçin. Dawiya dîktatorî û hovîtiya Erdogan nêzîk e."
Meşvanan bi sloganên 'Bijî berxwedana Qendîlê', 'Bakur, Başûr, Rojava û Rojhilat yek xebat û yek armanc', 'Ji dagirkeriyê re êdî bes e' mîting bi dawî kir…***ANHA***

## Kongreya Star ji bo Efrînê bang kir



Komîteya Têkliyên Dîplomasî ya Kongreya Star û hejmareke rêxistinên jinan bi daxuyaniyekê bang li Konseya Ewlehiyê û Civaka Navnetewî kirin ku komîteyeke wergirtina rastiyan li hundirê Efrînê ava bike da ku rewşa welatiyên Efrînê û destdirêjiyên dagirkeriya Tirkiyê bêne eşkere kirin.
Di çarçoveya çalakiyên qonaxa duyemîn a hemleya Kongreya Star a şermezarkirina destdirêjiyên artêşa dagirker a Tirkiyê û çeteyên girêdayî wê li Efrînê ya di bin durişmeya "Ji bo Efrînê serî hildin" de, Komîteya Têkliyên Dîplomasî ya Kongreya Star a bajarê Dêrikê û Komîteya Têkliyên Kongra Star a bajarê Hesekê di du daxuyaniyên cûda de destdirêjiyên artêşa dagirker a Tirkiyê yên li Efrînê û guhertina demografîk li Efrînê şermezar kirin.
Di daxuyaniyan de bang li rêxistinên navnetewî û jinan û civaka navnetewî û Konseya Ewlehiyê hate kirin ku destwerdanê bikin, welatiyên Efrînê biparêzin û dagirkeran û çeteyên wan ji Efrînê derxînin.
Her wiha rê li pêşiya kiryar û destdirêjiyên qirêj ên dagirkeriya Tirkikyê li Efrînê bigirin. Bang li aliyan hat kirin ku komîteyeke wergirtina rastiyan û lêpirsînê li Efrînê ava bikin da ku rewşa welatiyên Efrînê û kiryarên li dijî welatiyan bêne eşkerekirin."

## Li dijî PKK'ê me li hev nekiriye



Serokwezîrê Iraqê Ebadî, piştî civîna bi desteya wezîran re daxuyaniyek da û got: "Koordînasyoneke me ya têkildarî operasyoneke li ser sînor a bi Tirkiyê re nîne."
Serokwezîrê Iraqê Ebadî yê piştî civaîna bi Destaya Wezîran a Iraqê re kir û şûnde têkildarî êrîşên dagirkeriya Tirkiye ya li Başûrê Kurdistanê daxuyaniyek da û got: "Koordînasyoneke me ya têkildarî operasyoneke li ser sînor a bi Tirkiyê re nîne."
Ebadî bibîr xist ku divê Tirkiye rêz ji serweriya Iraqê re bigire û wiha got: "Em girêdayî Destûra Bingehîn a Iraqê ne. Bitaybet PKK jî di nav de em rê nadin di nava xaka Iraqê de çalakiyeke leşkerî pêk were. Ji ber ku PKK ne hêzeke ya Iraqê ye. Di heman demê de em dixwazin Tirkiye rêz ji serweriya Iraqê re bigire"

## NPG'ê gerîlayên Eyaleta Cîlo pîroz kir



Fermandariya Biryargeha Navenda Parastina Gel NPG'ê, ji ber çalakiyên gerîla yên 18'ê Hezîranê yên li Colemêrgê peyameke pîrozbahiyê weşand.
Di peyama nivîskî ya Fermandariya Biryargeha NPG'ê de hate gotin, "Çalakiya ku di çarçoveya Pêngava Şoreşgerî ya Şehîd Agirî û Şehîd Pîroz de 18'ê Hezîranê li qada Kani Orê ya li ser rêya navçeya Çelê ya Colemêrgê li dijî konvoya leşkerî hate kirin û derbên giran li hêzên dagirker mêtinger hate xistin, çalakiyeke serketî ye."
Fermandariyê wiha dewam kir: "Heman rojê li dijî yekîneya taybet a ji qereqola Gemanê ya li Çelê ji bo danîna kemînê derket, çalakiya sabotajê hate kirin û di qonaxa duyemîn a çalakiyê de bi ruhê fedayî yê Apocî û cesareteke bilind êrîş hate kirin. Di vê çalakiyê de derbên giran li hêzên dagirker hatin xistin û çalakiyeke serketî hate kirin.
Em fermandariya we û hemû fermandar û şervanên tevlî herdu çalakiyan bûne pîroz dikin û hêvîdarin ku her tim serketî bin. Di van çalakiyan de bi ku performanseke bilind û taktîkî ya dewlemend bêyî dayina windahiyan derbên giran li dijmin hatin xistin, em hemû hevrê û hêzên we yên eyaletê ku tevlî çalakiyê bûne silav dikin.
Ev çalakiyên we di heman demê de bûne derbek û li Serokkomarê Tirk Recep Tayyîp Erdogan ketine, ku her roj derdikeve ser dikê û bêyî li ber xwe bikeve derewan dike. Zîhniyeta nîjadperest-dagirker û faşîst ku tenê ji bo girtina dengan li Kurdistanê xwînê dirijîne, şer û berxwedana mezin mîna ku nîne nîşan dide û li meydanan bi gotina 'pirsgirêka Kurd nîne, me ev pirsgirêk çareser kiriye' rastiyan berevajî dike. Berxwedana gerîla rastiyan eşkere dike. Rastî ev e; berevajî îdîayên hêzên mêtinger û faşîst ku dibêjin 'me qedand, tine kir', gerîlayên azadiyê yên Kurdistanê di dema herî serketî û nêzî azadiyê de ne.Bi gotina, 'Me rêveberiya ku li Qendîlê di civînê de bûn ji holê rakir, ew têk bir, li filan cihî me derbên giran lê dan, paqij kir, ji hev belav dibin' bêyî li ber xwe bikevin derewên herî mezin dikin û bi vî rengî hewl didin civakê bixapînin. Bi vê wesîleyê, em berxwedana lehengiyê ya gerîla ku bersivê dide zîhniyeta faşîst, silav dikin ji hemû gerîlayên Kurdistanê re serketinê dixwazin."

## Ciwanên bakurê Sûriyê berê xwe dan başûrê Kurdistanê



Ciwanên bakurê Sûriyê bi şîara 'Serî Hilde' ji bo rawestandina dagirkeriya dewleta tirk a li ser başûrê Kurdistanê berê xwe dan deriyê Sêmalka. Ciwanan diyar kir ku wê bi rihê Avesta û Arînan li dijî dagirkeriyê rabin ser pêyan.
Ciwanên Bakurê Sûriyê û rojavayê Kurdistanê, li dijî dagirkeriya dewleta tirk a li ser başûrê Kurdistanê di çarçoveya 'Hemleya Duyemîn a Serî Hilde' de ber bi deriyê Sêmalka ve diherikin. Li bendê ye ku hezar ciwan derbasî başûrê Kurdistanê bibin.
Ciwanên kantona Qamişlo jî berê xwe dan Dêrikê û wê ji wir jî bi ciwanên kantonên din re berê xwe bidin deriyê Sêmalka.
Li Qamişlo 160 ciwan bi dirûşma 'Serî Hilde' û bi erbaneyan ber bi başûrê Kurdistanê ve ketin rê.
Ji ciwanan Barî diyar kir ku dewleta tirk a dagirker ferqê naxe nava kurdan û êrîşî tevahî kurdan dike û wiha got: "Bi taybet dixwazin ciwanên kurd ku hêza civakê ye, tune bikin. Ji bo vê jî em wek ciwan li dijî dagirkeriya dewleta tirk rabûne ser pêyan. Wê ciwanên kurd bi rihê Arîn û Avestayan li dijî dagirkeriyê rabin ser pêyan. Em bang li ciwanên kurd bi taybet jî ciwanên başûrê Kurdistanê dikin ku li dijî dagirkeriyê rabin ser pêyan."
Ciwanê bi navê Serdar jî dagirkeriya dewleta tirk şermezar kir û wiha axivî: "Em ê ji bo rawestandina dagirkeriya dewleta tirk berê xwe bidin başûrê Kurdistanê. Em wek ciwanên kurd amede ne ku li dijî dagirkeriya dewleta tirk çi bikeve ser milê me, em bikin."

## 6 leşkerên Tirk hatin kuştin

HPG'ê diyar kir ku hêzên wan li Dersim û Colemêrgê bi giştî 6 leşker kuştin. HPG'ê diyar kir ku heta 20'ê Hezîranê di êrîşên hewayî de tiştek bi hêzên wan nehatine û îdîayên medyaya AKP'ê derewan dikin.
Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê li ser malpera xwe ya fermî têkildarî çalakiyên li Dersim û Colemêrgê daxuyanî weşand.
Di daxuyaniya HPG'ê de ev tişt hatin diyarkirin:
"Di çarçoveya Pêngava Şoreşger a Şehîd Ozan û Şehîd Roza Dersim de di 19'ê Hezîranê de saet di 20.00'an de li dijî yekîneyeke artêşa Tirk a dagirker yên ku dixwestin li Girê Erman ê Dersimê cih bibin, hêzên me yên YJA-Starê çalakiyek li dar xistine. Hêzên me ji 2 aliyan de li çeperên dijmin dane. Di vê çalakiyê de 5 leşker hatine kuştin û 2 leşker jî birîndar bûne.
Di çarçoveya Pêngava Şoreşger a Şehîd Pîroz û Şehîd Agirî de hêzên me di 19'ê Hezîranê de saet di 10.00'an de li dijî leşkerên artêşa Tirk a dagirker ên li Girê Bayê yê Gevera Colemêrgê çalakiyek li dar xistine. Di vê çalakiyê de leşkerekî artêşa Tirk a dagirker hatiye kuştin.





# Projeya vekirina malên çandê

***Navenda Çand û Hunerê ya Mihemed Şêxo ya bajarê Qamişlo, bi mebesta ku herkes li çand û hunera xwe xwedî derkeve li taxên Qamişlo dest bi avakirina malên çandê kir. Rêveberê Mala Çandê yê li Hîmo Ehmed Mehmûd diyar kir ku armanc ji vê yekê ewe ku her kes li çanda xwe xwedî derkeve.***

**Melek DEMÎRTAŞ**





Navenda Çand û hunera Mihemed Şêxo ya bajarê Qamişlo, bi mebesta ku durbûnê nêzîk bike û herkes li çand û hunera xwe xwedî derkeve. Li taxên Qamişlo dest bi avakirina malên çandê kirin.
Girêdayî mijarê Rêvebirê Mala çandê ya Li Hîmo Ehmed Mehmûd ser armanc û avakirina malên çandê ev agahî da: "Bajarê Qamişlo bajare kî mezine û ji du beşan pêk tê, milê Şerqê û Xerbê heye û tenê Navend çand û hunerê heye. Ehmed axaftina xwe wiha dom kir: "Her wiha carana ji ber durbûna rê hind pirsgirêk derdiketin, û provatên endman lawaz dihatin kirin. Ji bo ku em van pirsgirêkan çareser bikin û rê li pêşya wan bigrin. Wekî Tebgera Çand û Hunera Demokratîk ji destpêka vê slaê projeya avakirina mala çandê li taxan hate pêşniyar kirin."
Ehmed diyar kir ku ev sê mehe ku ev proje pêk hat û wiha got: "Li taxa Qudurbeg beriya sê mehan bi merasîmekê mala Çandê hate vekirin û endma provat û çalakiyên xwe bi qordînekirina vanenda giştî ya Mihemed Şêxo re bi rengekî rotînîn dibînin. Her wiha li Hîmo jî ku ev du heftînê mala çandê hatiye vekirin, ku 22 endam ji temenê 10 heya 22 hene. Di herdu malan de jî hersê komên hunerê ji şano, govend û mûzîkê heye û di heftiyê de du caran provatên xwe dikin."
Ehmde Mehemûd di dawî de anî ziman ku bi vê mala çandê gelek pirsgirêk çareser kirin, her wiha endam zêde bûn û bi rengekî rehet xebatê çand û hunerê didin meşandin. Armanca me jî ewe ku herkes xwedî li çanda xwe derkeve û hemû astengiyan bi tekoşîn û nûbûnê derbas bike."
Hêjayî gotinê ku di rojên pêş de dê mala çandê dê li taxa Hilêliyê jî bê vekirin, her wiha wê li hemû taxên bajarê Qamişlo bêne vekirin."

## Kurdên Xelxalê nikarin bi kurdî biaxivin



Heta niha gelekî kêm behsa kurdên Xelxal hatiye kirin. Kurdên Xelxalê li parêzgeha Erdebîl û li nêzîkê deryaya Qezwîn, bi sedan kîlometre dûrî Kurdistanê dijîn. Parêzgeha Erdebîlê jî yek ji girîngtirîn navçeya tirknişîn a Îranê ye, lê bi sedan malbatên kurd li vî bajarî dijîn.
Kurdên Xelxalê bêhtir li bakurê Xelxalê ne ku bi tevahî ji16 gund an pêk tên. Zêdetir ser bi du eşîretên bi navê 'Şetranlû' û 'Xaştanlû' ne. Navendeke din a kurdên Xelxalê li başûrê wê qezayê ye û ji çend gundan pêk hatiye.
Koça kurdên Şikak ji sînorê navbera Îran û Împeratoriya Osmanî, di serdema desthilatdariya Şah Ebasê Sefewî de dest pê kiriye. Şah Ebas nêzîkî 50 hezar malbatên kurmanc û Şikak ên Mehabad û Urmiyê bo deşta Weramîn a li tenişta Tehranê veguhestine.

### SERDEMA ŞAH EBAS

Şah Ebas koçberkirina kurdan berdewam dike û kurdên ku ji bo Weramîn hatine koçberkirin bi mebesta rûbirûbûna li gel êrîşa Ozbekan bo Xorasan tên veguhestin.
Projeya veguhestina kurdan ji aliyê hikûmetên desthilatdar ve didome û di serdema Nadir Şahê Evşar de prose bi leztir dibe û di 6 salan de 50-60 hezar malbatên kurd, 13 hezar malbatên hoza koçerî 'Heft Leng' û 6 hezar malbatên eşîreta Gurcî bo Xorasan tên veguhestin.
Di vê koçberkirina kurdan de ya bo Xorasanê, çend hozên naskirî yên kurdan bo Gêlan û Mazenderan ên li bakurê Îranê hatine veguhestin, piştre heft hozên kurd ji Xorasan bo bakurê Îranê tên şandin.

### HEFT HOZÊN WAN HENE

Kurdên Xelxal ji heft hozên Şatranlû, Xaştanlû, Klûkişanlû, Huyranlû, Mûntanlû, Nesranlû û Daykanlû pêk hatine. Ew malbat destpêkê li navçeyeke tenişta bajarê Gîw bicîh dibin. Dr. Henry Field derbarê kurdên ku li wê navçeyê bicîh bûne wiha nivîsiye: "Kurdan sînorên xwe bezan dibe û li çar cihên navçeya Xelxala bakur bicîh bûne." Lêkolerê fransî Marshall Bazaine di kitêba kulturî û cagrafyayî ya Îranhe de wiha dibêje: "Zimanê kurdî li navçeya Axçe Qişlaq, Wasfircan û Îqabaş tê bikaranîn û gundên Binyadabad, Gezur, Leng Deşt, Eblî, Zawçe Kurd, Elnekeş, Îlwaniq, Wanawîz ên li bakurê Xelxal beşek in ji navçeyên Kurdnişîn."

### BANDORA ZIMANÊ TIRKÎ

Di 300 salên borî de plana guhertina ol û rêgeza li ser wan kurdan berdewam e û kesekî wek 'Ecem Axa' piraniya wan kurdan neçar kir ku dest ji ola xwe berdin û niha tenê du gundên kurdnişîn Caferawa û Sechurd ên başaûrê Xelxal mezhebê sunî ne û yên din bûne şiî, zimanê wan jî ku kurdî û zaravayê kurmancî bû, niha di metirsiyê de ye. Kurdên Xelxalê ji ber jiyana li yek ji navendên girîng a ziman û kultura tirkî li Îranê neçar bûn ku fêrî tirkî bibin û tenê pîremêr û pîrejinên wan gundan bi kurmancî diaxifin…***jêder/e-rojname***


## 2.Pêşenghea pirtûkan a Rojava li darkeve




Desteya Çandê ya Herêma Cizîrê bi boney duemîn salvegera Şehdaeta Ş.Hisên Şawîş (Herkol) 2.Mihrîca Pirtûkan di 20'ê Tîrmehê de li bajarê Qamişlo tê li darxistin.
Têklîdarê mijarê Berpirsa Buroya Ragihandina Desteya çandê ya Herêma Cizîrê Leylan Cemal ev agehî dan: "Bi rasthatina slavegra şehdaeta nivîskar û rewşenbîr Hisên Şawîş (Herkol) dê 2. pêşenghea pirtûkan di 20 meha Tîrmehê de li bajarê Qamişlo bê lidarxistin. Her wiha ji bo amedekariyên vê pêşengehê jî komîte ji 7 kesean pêk tê hate vakirin, dê ku bi kar û barên pêşengehê rabin."Di pêşengeha sala derbas bûyî de wekî mêvan nivîskar û rewşenbîrê Lubnanê Ebas Ceaver Huseyînî hatibû vexwendin, di vê salê de jî dê mevanek biyanî bê vexwendin, lê hîn ne diyar kîye."
Her wiha weşanxane, çapxane, nivîskar û rewşwnbîr dikarin beşdarî vê pêşengehê bibin. Tê payîn ku pêşengeha Pirtûkan ser 4 rojan bêli darxistin, di pêşengehê dê masya nîqaşê jî ser erk û xebat û rexnegkirina ser pirtukan çêbibe.
Hêjayî gotinê ku di pêşengeha Pirtukan de hemû cureyên pirtuk û nivîskar û rewşenbîrên Rojava, Sûriyê û Europa dikarin beşdarî bibin, Pêşengeh ji her kesî re vekiriye dikarin beşdarbibin.
Berpirsa Buroya Ragihandina Desteya çandê ya Herêma Cizîrê Leylan Cemal da zanîn ku armanca ku çanda xwendinêdi civakê de zimdî bikin, ji ber ku gel gelekî durî xwendinê ketiye, her wiha jî hêzdayîna rewşenbîrna jî. Hêjayî bi bîrxistinê ku wê deriyê qeydkirinê dê di 1'ê Tîrmehê de bê girtin."***Ronahî/Qamişlo***

## Werin em dikarin

**Xelîl XEMGÎN**



Di sedsala 21'an de, çîna serdest ji bo parastin û zeftkirina desthilatdariyê, li ser civakê, bi metodên 'zext û zeft' ê hakimiyeta xwe berdewam dike.
Yekemîn 'Ol' ango 'Dîn', duyemîn jî 'Demokrasî', ango 'Demogojî' ye!
Herî zêde, civakên ku bi bawermendiya xwe misilman in, bi navê 'Ol û Dîn'ê çîna desthiladar û hişmendiya hukumdar, ji bo hukumdariya xwe bi kar tînin. Nexasim bêjeyên 'Ol' û 'Demokrasî'ê gelekî bikar tînin. Di vê derbarê de, meriv dikare bêje ku hemû dewletên misilman, lê bi teybetî pergalên li rojhelata navîn, her weha, serkêşiya vê şêwaza xapînok û sexte li ser civakê dewleta tirk û bi teybetî jî xeta Erdoğan dike!...
Gelo ev metod çi ne, çawa pêşkêşî civakê dikin, rastiyan çawa berûvajî dikin, civakê çawa dixapînin, însana çawa ji xeta mirovahiyê derbeder dikin?
Dizanim mijareke gelekî kûr û fireh e, lê bi kurtî ka em ji Ol û Oldariyê de destpêbikin. Yezdanê dilovan dibêje: 'îne dîne lahî lîl lah. Feleyse lil îbadî île îttaa' ango, dîn ê xweda ye, tenê di navbera mirov û xweda de, bi bawer be!...
Dîsa, yezdanê dilovan gotiye û di gelek hedîsên pêxember de hatiye piştrastkirin.'Îne xeleqnakum şiuben we qabail li taaruf, fele ferqun arabiyin elle alajamî, we abyadin elle el eswed.... ile bi taqwa..' ango, 'me hûn jî wekî gelan û qebîleyan xuliqandine, bo yezdanê mezin cudahiya yê ereb ji yê ecem yê çerm sipî ji ê reş û sor nîne, cudahî tenê di asta baweriyê de ye!
Li welatê me, ku nîrê zulma dagirkerî bê hed û hudud e, li cîhanê dagirkeriyek wisa dijwar tune ye. Dagirkeriyeke ku hemû pîvan û zagonên gerdûnî û xwezayî berovajî dike û bin pê dike; qirkirin, talankirin, îmhakirin, înkarkirinê û hwd dike.Ji peymana Lozanê vir ve, li dewleta Tirkiye, Îran, Iraqa Sedam û Sûriyeyê binihêrin, metoda ku civakê pê 'terbiye' dikin 'Ol' e!..
Mîna ku misilmantî û oldariya gelê kurd hîn nekemiliye, çi sextekariyên bi navê 'Ol' û oldariyê hene, mîna ku rast bin, dixwazin bi kurdan bidin pejirandin.
Lê belê, esasên ku di hemû olan de hene, di bin navê 'em hemu bira ne' her tim hewildane ku bi civakê bidin jibîrkirin. Ger em bira ne, gelo kîjan dînê Yezdan dibêje ku ziman, çand, huner, wêje û dîroka birayê xwe yê misilman qedexe û înkar bike?Gelo ev çi dîndarî ye, ku tenê di 16 salên dawiyê de, bi sedan zarokên kurdan hatine kuştin û bi sedan jî di zindanan de îşkence, zulm û zor û tecaviz li ser wan pêk anîye?
Heman tişt ji bo rejîma Îranê ku xwe wekî dewleta îslamî ya resen dinasîne jî derbasdar e. Sedam heman tiştî kir; di destekî wî de Qur'ana pîroz, di destê din de jî çekên kîmyewî û Enfal…
Ev pergalên dagirker ên hov, dixwazin gelê kurd û hemû pêkhateyên din jî tune bikin. Berî her tiştî, neyarên xweda û Yezdanê dilovan in! Jiber ku neyartiya dayîna xweda û xwezayê dikin!
Duyemîn jî, maskeya 'Demokrasî'yê ye. Hişmendiya van dewletan bo Demokrasiyê, rê û rêbaza zeftkirin û mayîndekirina desthilatdarîyê ye.
Bi şev û roj gotina demokrasiyê ji devê wan dernakeve, lê bi navê demkrasiyê gelan qir dikin, tune û înkar dikin! Bi dehhezaran siyasetmedar û xebatkarên demokrasîxwaz û aştîxwaz di zindanan de ne. Ala faşîzmê li her qadê, bi gef û tehdîdan, li ser civakê ferz dikin û ji vê re jî dibêjin 'demokrasî'!
Xeta erdoğan û AKP-MHP'ê xeta neyartî û dijmintiya gelan e. Di van çar/ pênc rojên ji helbijartinê re mane de, meriv dikare 'qedera reş' a li ser me hatiye ferzkirin, veguhêze qedera rojên bê zordarî, zext, zindan, girtin û kuştin! Rojên ku êdî şer û pevçûn, êrîş û çavsorî nebin; rojên ku em hilweşandina Sur, Cizîr û Efrînê, veguhêzin qadên aşitî û biratiya gelan... Hûn dikarin vê rewşê veguhêzin; Hûn Dikarin, Hûn Dikarin!
Bi hêviya serkeftina Demîrtaş û HDP'ê.

# Salvegera rizgarkirina Girê Spî

***Bi sedan welatiyên Girê Spî û navçeyên Eyn Îsa, Silûk sêyemîn salvegera rizgarkirina Girê Sipî ji dagirkeriya DAIŞ'ê bi şahiyekê pîroz kirin. Pîrozbahiyê de li ser navê sazî û rêveberiyan axaftin hatin kirin û bang li pêkhateyan hat kirin ku yekîtî û piştgiriya xwe xurt bikin.***

Şêniyên Kantona Girê Spî li qada Meclîsa Sivîl a bajêr bi şahiyekê salvegera 3'yemîn a rizgarkirina Girê Spî pîroz kirin.
Bi sedan şêniyên Girê Spî û navçeyên Eyn Îsa, Silûk ji bo pîrozkirina 3'yemîn salvegera rizgarkirina bajêr li qada meclîsê ya Girê Spî ku bi wêneyên şehîdan û alên YPG'ê YPJ'ê û hêzên QSD'ê hati bû xemlandin, kom bûn.
Şandeya Rêveberiya Xweser a Kantona Kobanê tevlî şahiyê bû. Di şahiyê de li ser navê sazî û rêveberiyan axaftin hatin kirin.
Şêwirmendê Hevserokê Meclîsa Kantona Girê Spî Xelîl Ebdulkerîm axivî û spasiya hemî hêzên ku herêm rizgar kirine kir. Ebdulkerîn di berdewama axaftina xwe de anî ziman ku bi saya xwîna şehîdan û bi vîna jina azad jiyaneke bi rûmet û aram dijîn û ji bo bi dawîkirina aloziya Sûriyê banga danûstandinê li hemî pêkhateyên Sûriyê kir.
Fermendarê YPG'ê Ebû Mazlûm jî axivî û got: "Em bostek axa welatê xwe bernadin û heta rizgarkirina tevahiya Sûriyê ji DAIŞ'ê em ê tekoşîn bikin".
Hevserokê Meclîsa Rêveber a Kantona Kobanê Enwer Muslim jî di pîrozbahiyê de axivî û bang li hemû pêkhateyên herêma Girê Spî kir ku beşdarî avakirina civakeke demokratîk û hevbeş bibin û ji bo yekîtiya Sûriyê li dora saziyên xwe yên sivîl, leşkerî û siyasî kom bibin û li hember planên dewleta Tirk ên li dijî herêmê bisekinin.
Endamê Partiya Sûriya Pêşerojê Kedîm Ibrahîm salvegera rizgarkirina herêmê li şêniyan pîroz kir û bang li hemû pêkhateyên Sûriyê kir ki ji bo yekîtiya Sûriyê hemî tevlî danûstandinan bibin.



Piştî bi dawîbûna axaftinan, komên çand û huner ên bajêr şanoyek bi navê (Biratiya Gelan) pêşkeş kirin. Her wiha şahî bi gerandina govendê bi dawî bû…
***ANHA***

## Bazara Eyn Îsa geş buye



Welatiyên navçeya Eyn Îsa û gund û bajarokên derdorê berê xwe didin bazara Eyn Îsa û hemû pêdiviyên xwe ji vê bazarê peyda dikin. Bi taybet ji ber rewşa ewlehî û aramiya li herêmê, bazara Eyn Îsa jî geş buye.
Ji ber buhaya baş û peydabûna madeyên cûda welatî zêdetir berê xwe didin bazara Eyn Îsa.
Di bazarê de dikanên cûr be cûr ên cilûbergan, pêdiviyên malê û xwarinê tên peyda kirin.
Di bazarê de bêtirî 110 dikan hatine vekirin û li rex wan di kolanên teng ên bazarê de jî gelek firoşkar û dikanên din hene.
Di encama xebatên Komîteya Çavdêrî û Zimhêrê ya girêdayî Rêveberiya Xweser di van demên dawî de buhayên pêdiviyan jî gelekî erzan bûne, bi taybetî piştî ku piraniya pêdiviyan ji bajarên Minbic û Reqayê tên wergirtin.
Yek ji sedemên geşbûna aborî li navçeya Eyn Îsa li gorî rêveberan ew e ku ewlehî û aramî li giştî herêmê serwer e. Navçeya Eyn Îsa yek ji herêmên ku hejmara welatiyan têde zêde bûye. Bi taybetî hejmareke zêde ya koçberan berê xwe dane vê herêmê.
Girêdayî mijarê welatiyê bi navê Îsmaîl El-Ebid ê ji gundê El-Ursî ya gundewarê navçeya Eyn Îsa diyar kir ku pêşbirkiya di navbera bazirganên navçeyê de bandoreke erênî li buhaya madeyan kir û wiha got: "Hemû pêdivî û pêwîstiyên welatiyan di bazarê de bi buhayeke baş tên peydakirin. Bi saya vê bazarê êdî em ne mecbûr in biçin bajarên weke Minbic, Kobanê û Reqayê û pêdiviyên xwe ji van bajaran peyda bikin."
Dikandarekî bi navê Hilal El-Mihemed destnîşan kir ku buhaya pêdiviyan hêdî hêdî erzan bûn û êdî her tişt di vê bazarê de tên peydakirin. Her wiha di aliyê sebzeyê de jî li herêmê sîstema xwetêrkirinê pêk tê…***ANHA***

## Şaredariya Çiyayê Kizwanan nikare xizmetê bike







Şaredariya Gel a Çiyayê Kizwanan ji ber kêmderfetan û tunebûna alavan nikare projeyên xwe pêk bîne.
Şaredariya Gel a Çiyayê Kizwanan ku di 24'ê Îlona 2017 hatiye vekirin, alav û amûrên wê yên xebatê tune ne. Di encamê de û ji ber van kêmderfetan nikare proje û pilansaziya xwe pêk bîne.
Hevseroka Şaredariya Gel a Çiyayê Kizwanan Hind El-Ebdullah diyar kir ku gelek alavên wan ên şaredariyê nayên peydakirin û da zanîn ku seyareyeke wan jî tune ye da ku gera xwe li gundên Çiyayê Kizwanan bikin û rewşa van gundan bişopînin.
Hind di axaftina xwe de diyar kir ku wan di pilansaziya xwe de gelek proje danîbûn pêşiya xwe lê kêmderfetî û tunebûna alavan li pêşiya pêkanîna van projeyan dibin asteng.
Hind El-Ebdullah bang li aliyên têkildar kir ku alîkariya wan bikin, alavên pêwîst ji şaredariya wan re peyda bikin da ku karibin bi rêk û pêk xizmeta welatiyan bikin û devera çiyayê Kizwanan pêş bixînin…***ANHA***

## Mamoste ji bo sala perwerdê ya nû xwe amade dikin

Komîteya Şopandina Dibistanan a navçeya Til Hemîsê, bi armanca xurtkirina şarezayên mamosteyan li 3 navendan dewreyên perwerdê vekir.
Dewreyên perwerdê di 18'ê vê mehê li 3 navendan (Dibistana amadehî ya Til Hemîsê, navenda Şehîd Devrim û navenda dibistana Mehmûd El-Dehas) dest pê kiri bû.
Ji ber hejmara mamosteyên seretayî zêde bû, komîteyê mamosteyan li du navendan belav bikin, Navenda dibistana Mehmûd El-Dehas 320 mamoste, navenda dibistana amadehî ya Til Hemîsê 230 mamoste, her wiha navenda Şehîd Devrim 200 mamosteyên Branşan ên asta navîn û amadehî.
Dewreyên perwerdê ji aliyê mamosteyên ku di mijarên Zimanê Erebî, zanyarî, Fîziya, Kîmya, Bîrkarî, Dîrok û Erdingarî de pispor in tên dayîn.
Perwerde wê heta 2 mehan berdewam bike.
Bernameya perwerdê ya rojane wiha ye: şêwazên wanedayînê 2 demjimêr, demê mayî waneyên Zimanê Erebî, bîrkarî û zanyarî tên dayîn…***ANHA***



## RAMANÊ RÊBERTIYÊ



### Sosyalîzm û Kapîtalîzm -1-

**Abdulah Ocalan**

Li dijî ferdperestiya ku modernîteya kapîtalîst li ser civakê ferz dike, parastina civakbûnê û têkilîdanîna wê bi daxwazên azadî û wekheviyê re îdealên bingehîn ên utopya sosyalîzma klasîk in. Hesreta ji rêûresmê ya ji bo civak, azadî û wekheviyê bi hegemonîkbûna kapîtalîzmê re dijwartir bûye. Her ku hegemonya îdeolojîk a lîberal bi pêş ket, utopyayên civakî jî ketin bin bandora zanistên pêş diketin û xwe sosyalîst îlan kirin. Di serdema nû de hegemonya sîstema şaristaniya navendî dest guhert û ev di encama têkoşîna dirêj a bajarbûna Ewrûpaya Rojava de pêk hat. Hegemonya şaristaniyê ya welatên Îslamî, Çîn û Hindistanê di destê xwe de digirtin bi awayekî bingehîn di sedsala 16. de destpê kir, bi lez dest guhert. Çanda bajêr a Ewrûpaya Rojava bi awayekî serketî çanda navendên şaristaniyê kir malê xwe û di destguhertina hegemonyayê de ev yek bi rola sereke radibe.Çawa ku tê zanîn, şaristaniya Ewrûpaya Rojava ne bi çanda Xiristiyantiyê û hêza wê ya çareserker, lê ji ber ku nikarîbû bersivê bide pêdiviyên jiyana bajarê nû, li çandên nû geriyaye. Xiristiyantî li hemberî pêşketinên sedsala 16. bi tenê bi reformê dikarîbû xwe dewam bikira. Reforma di dîn de gelekî kêm dikarîbû bersiva pêdiviyên çandî yên şaristaniya bajarê nû bidaya. Netewebûyîna dêrê bi xwe ji dil nebû, guhertineke şêweyî bû. Çavkaniyên bingehîn ên ku pêdiviya çandê pê hebû, Îslama Rojhilata Navîn, şaristaniyên Çîn û Hindistanê bûn. Veguhestinên ji van navendan, di dawiya sedsala 18. de bi şoreşên polîtîk û civakî yên Fransî û ekonomiya Ingilîz bi encam bûne. Hemin bandora gelek faktorên din jî di vê yekê de hene. Herçiqasî keşif û vedîtinan rê li ber nûtiyê vekiribin jî di tehlîla dawî de eşkere bû, eger ji navendên şaristaniyê veguhestina çandî nebûya, destguhertina hegemonyayê jî ne pêkan bû. Bêguman ji Ewrûpayê hat ku bi tevgerên Ronesans, Reform û Rohnîbûnê sentez û nûbûneke mezin pêk bîne. Em di demên berê yên dîrokê de tevgerên bi vî awayî li Kevana Bi Bereket, Mezopotamya Jêr, Rojhilatê Derya Spî û peravên Egeyê dibînin. Ya rastî, sîstema şaristaniya navendî ya bi rêzê li van navendên dîrokî pêk hatiye, weke xeleka mezin a dawî li peravên Ewrûpaya Rojava rehên xwe berdane. Di vê de şaristaniyên bajêr ên Îtalyayê bi roleke diyarker rabûne.Di çarçoveya mijara me de girîngiya vê şaristaniya nû, ango modernîteya kapîtalîst ew e, paradîgma nû ya zanistî kiriye bin hegemonya xwe. Zanista nû ya pragmatîk a li şûna dîn, heta li şûna zêhniyeta bi koka xwe felsefî hat danîn, bû nirxeke payeberz û hêja. Şoreşa zanistî ya di dawiya sedsala 18. de li zanîngehan bi pêş ket, şoreşên din ên polîtîk, civakî û ekonomîk temam kirin. Zanistên fizikî yên bi ceribandinê û zanistên têkiliya xwe bi xwezaya civakî re bi awayekî bingehîn ji hev cihê kirin. Di nava wan bi xwe de jî gelek qadên pisporiyê û şaxên zanistî pêkanîn. Hegemonya îdeolojîk a lîberal zêde dereng nema mohra xwe li zanista civakî xist. Encamên erênî yên şoreşan di bin yekdestdariya xwe de kedî kir û bi berjewendiyê xwe re kir ahengekê. Utopya sosyalîst ber bi nîvê sedsala 19. ve bi pêşengiya K. Marks û F. Engels xwe weke sosyalîzma zanistî eşkere kir û ev bi bandora zanistperestiya lîberalîzmê pêk hat. Jixwe K. Marks û F. Engels eşkere anîn ziman ku sosyalîzma wan a zanistî sentezeke felsefeya Elman, polîtîka ekonomiya Ingilîz û sosyalîzma Franseyê ye.



# Ji Jinên Kurdistanê helwesta hevpar

***Rêxistin û partiyên jinan ên 3 parçeyên Kurdistanê li dijî dagirkeriya dewleta Tirk daxaznameyek radestî Parlamantoya Herêma Kurdistanê kirin. Rêxistinên jinan têkildarî mijarê li avahiya Yekîtiya Jinan a li bajarê Silêmaniyê daxuyaniyek dan çapemeniyê û êrîşên dewleta Tirk yên li ser başûrê Kurdistanê şermezar kirin."***



Rêxistin û partiyên jinan ên 3 parçeyên Kurdistanê li dijî dagirkeriya dewleta Tirk daxaznameyek radestî Parlamantoya Herêma Kurdistanê kir û banga têkoşînê kir.
Rêxistinên jinan ên Başûr, Rojhilat û Rojavayê Kurdistanê, têkildarî mijarê li avahiya Yekîtiya Jinan a li bajarê Silêmaniyê daxuyaniyek da çapemeniyê.
Li ser navê jinên nivîskar û rojmaneger Kinêr Ebdulah axivî û got ku ew weke jinên Rojhilat, Rojava û Başûrê Kurdistanê van êrîşên dewleta Tirk ên li ser xaka Herêma Kurdistaên şermezar dikîn.
Kinêr Ebdullah destnîşan kir ku divê li dijî dagirkeriyê hemû hêzên Kurdistanê bibin xwedî helwest û da zanîn ku wan jî weke rêxistinên jinan daxwazên xwe pêşkêşî Parlamento û Hikûmeta Herêma Kurdistanê kiriye.
Daxwazên jinan ku ji 4 xalan pêk tên wiha ne:
1 – Em daxwaz ji Parlamentoya Herêma Kurdistanê dikin ku sînorên herêmê ji dewleta Tirk re bigire û bi lezgîn civîneke pêk bîne.
2 – Kar û xebat bikin li ser biryara bi hejmara 37 ya sala 2003'an ku Parlamantoya Herêma Kurdistê girtibû û dewleta Tirk ji xala Başûr derbixin.
3 – Em daxwaz ji hikûmeta Iraqê jî dikin peymanên xwe yên bi dewleta Tirk re betal bike.
4 - Pêwîste di her alî de parastina mafê mirov bê kirin, bi tayebet jî mafên kesên dibin metirsiya dagirkerî û bombabaranê de ne bên parastin.

## Çîrokek ji Babê ber bi çiyayan ve



Li gundê Kefer Zixerê yê Babê ji dayik bûye. Bavê wê Kurd e, diya wê Ereb e. Yek ji 7 zarokan e. Çîroka gerîla Gulbahar ji berriya Babê dest pê dike û heta çiyayên bilind ên li Başûr dewam dike.
Gulbahar Botan li bajarê kefer Zixerê yê Babê ji dayik bûye. Bavê wê Kurd e, dayika wê Ereb e. Yek ji 7 zarokan e. Ji 5 saliya xwe ve li wêneyê li odeya herî mezin a malê temaşe dikir û meraq dikir bê kî ye. Dema ku hinekî din mezin bû, bavê wê jê re gotiye ku ew wêne yê Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan e. Piştre 'Apocî' li mala xwe dît û gav bi gav hîn bêhtir xwe nêzî wan kir. Li nava mala xwe timî li çîroka Apociyan guhdarî kir, bi taybetî li gotina bavê xwe: 'Hinekî din mezin bibin û hûn jî bibin mîna wan jinên serbilind'. Heta tevlîbûnê, timî derdora xwe şopand.
Sala 2012'an şevekê bi zorê deriyê wan hate vekirin. Kesên çekdar ku wê piştre hîn bibûya çeteyên El Nûsra ne, bi qareqar ketin hundirê her odeyê û ew li salonê li hev civandin. Çeteyên ku bi Erebî û Tirkî xeber dikirin, destpêkê televîzyon, radyo û telefon, piştre jî çi li ber wan ket, hemû şikandin. Dûre jî bi qondaxa çekê li bavê wê xistin.
Gulbahar û xwişk-birayên wê fêhm nekirin bê çi qewimî. Bi lêdan, xeber û gefxwarinê, bavê wê bi hinceta 'Alîkarî daye Apociyan' birin.
Bi vê gotinê qala wê rojê dike: "Mîna ku tarîtiya şevê bi carekê ve xwe berdabû ser her derê. Em piştî wan derketin derve, lê belê bavê min li wesayitê siwar kirin û bi lez birin. Me tiştek ji kesî re negot. Eger rejîmê bibihîsta wê hîn nebaş bibûya. Mîna ku per û baskê me şikestibû. Dayika min hewl dida hêzê bide me, lê rewşa wê bi xwe jî nebaş bû."
Gulbahar biryarê dide tevlî jiyan û refên azadiyê bibe. Ji dayika xwe re dibêje, "Dema ku bavê min hat, jê re bêje ku ez jî tevlî çîroka Apociyan dibim ku wî ji min re qalê dikir." Bi vî rengî ji malê derdikeve.
Dema ku li ser rêya têkoşîna azadiyê ye, li maleke ku lê dima jê re hate gotin ku YPG'iyan bavê wê ji destê çeteyan rizgar kirine. Rêberê daye pêşiya wan, wêneyekî bavê wê yê bi malbata wê re hatiye kişandin nîşanî wê dide. Gulbahar dema vê dibihîze ji kêfa hevrêyên xwe hembêz dike. Dibêje, "Ez careke din piştrast bûm ku min biryara rast da."
Gulbahar niha li çiyayên bi heybet li dijî leşkerên dagirker ên Tirk ku mîna DAÎŞ û çeteyên El Nûsra ne, şer dike. Germahiya hevrêyên wê bûye derman ji êşên wê re.
Nameyek ji bavê xwe re nivîsî ye û bi navê 'Hevrêya te Gulbahar a Apocî' mohra xwe li binî daniye.
Qala çîroka xwe ya li ser serê çiyê kiriye…***ANF***

## Mil bidin milê gerîla



Jinên Ciwan ên Başûrê Kurdistanê ku serdana mertalên zindî yên li Qendîlê kirin bang li pêşmergeyan kirin ku bi gerîlayan re di heman çeperê de li dijî dagirkeriyê berxwe bidin û ragihandin ku ew ê bi riheke berxwedêr li dijî dagirkeriya Tirk rawestin.
Roja 20'ê Hezîranê Jinên Ciwan yên Başûrê Kurdistanê serdana mertalên zindî yên li Qendîlê kirin û daxuyaniya çapemeniyê dan.
Bi navê jinên ciwan ên Başûrê Kurdistanê Zîlan Mûsa axivî û diyar kir ku ew weke Tevgera Jinên Ciwan heya dagirkeriya li ser Başûrê Kurdistanê berdewam bike, wê çalakiyên xwe berdewam bikin.
Zîlan ku her wiha got ku ew ê ti carî rê nedin dagirkeriyê û got, "Çawa li Şengal û Rojava berxwedan li dijî dagirkeriyê hebe, em ê jî li Başûrê Kurdistanê li dijî dagirkeriyê li berxwe bidin."
Zîlan Mûsa bang li HiKûmeta Başûr jî kir serî ji dagirkeran re netewîne û got, "Divê hikûmeta Başûr serî ji dagirkeriyê re ne tewîne û gotin neyêne ser şerefa gelê Kurdistanê."
Zîlan di dawiya daxuyaniyê de jî bang li hêzên pêşmerge jî kir û wiha axivî, "Pêşmerge çawa ku berê li çiyayên Kurdistanê çek di destê wan de bû û paşê gerîla vê berxwedanê ji wan dewr girtibe, divê niha di çeperên berxwedanê de mil bidin milê gerîla û li dijî dagirkeriyê rawestin. Em ê weke jinên ciwan bi riheke berxwedêr li dijî dagirkeriyê rawestin."
Daxuyanî bi dirûşma, li dijî dagirkeriya Tirk 'Serî Hilde' bi dawî bû.

## Jin wê di festîvala zîlan de bên cem hev



YJK-E'yê ji bo 14. Festîvala Jinê ya Zîlan banga tevlîbûnê kir ku wê 23'ê Hezîranê li bajarê Dortmund ê Elmanyayê bê lidarxistin.
Yekîtiya Jinên Kurdistanê li Elmanyayê (YJK-E) daxuyaniyeke nivîskî weşand û got, "Em 14. Festîvala Jinê ya Zîlan bi dirûşma 'Parastina Efrînê parastina şoreşa jinê ye' 23'ê Hezîranê li bajarê Dortmund ê Elmanyayê li dar dixin. Em li bendê ne ku gelê me û dostên me yên li Elmanya, Hollanda û Belçîkayê tevlî festîvalê bibin."
YJK-E'yê destnîşan kir ku têkoşîna azadiyê ya jinê li dijî sîstema modernîteya kapîtalîst weke serhildana herî radîkal derketiye holê û diyar kir ku paradîgmaya civaka demokratîk-ekolojîk-azadîparêziya jinê li Rojavayê Kurdistanê bi pêşengiya jinan ketiye meriyetê.
YJK-E'yê diyar kir ku paradîgmaya civaka demokratîk-ekolojîk, azadîparêziya jinê ku Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan afirand, bi îradeya qewîn a jinên Kurd veguheriye rastiyê û got, "Ji ber vê yekê, em ji her demê bêhtir bi biryar in ku li dijî êrîşên qirkirinê û faşîzmê, Rêberê xwe azad bikin, berxwedana serdemê bi ser bixînin û jiyana azad û azadiya jinê misoger bikin."


## Ji bo siberoja azad em ê tevbigerin



Rêxistina HDP'ê ya Êlihê bi tevlêbûna deh hezaran miting pêk anî. Di mîtîngê de Hevseroka HDP'ê Pervîn Buldan axivî û got: "Di serdema AKP'ê de zilm, zordarî û kuştin zêde bû. Wan wekî Heskifê di bin avê de bihêlin."
Di çarçoveya xebatên hilbijartinê yên HDP'ê de li Êlîhê mîtîng hat lidarxistin. Hevseroka HDP'ê Pervîn Buldan di mîtîngê de gel silav kir û wiha got: "Em di dîrokê de her dem bûn şahidê êşên mezin. Wekî Roboskê, Wekî Efrînê û herî dawî wekî Pirsûsê rojek berî cejnê li Pirsûsa Rihayê li ber nexweşxaneyan qetil kirin. Gelê me vê zilmê ji bîr nake. Gelê me dê di 24'ê Hezîranê de AKP'ê di sindoqê de defin bike û bersîve bide.
Êşa ku gelê kurd dijî, piştî 16 salên AKP'ê zêdetir bû. Hiekûmeta AKP'ê ji êş, birçîbûn, zilmê wêdetir tiştek bi xwe re neanî. Niha tenê tiştekî dikin. Bêbextiyê dikin. Heriyê davên HDP'ê û Demîrtaş. Her roj heriyê daêjin. Li vî welatî dê biratiya gelê kurd û tirk bîne. Dê li vî welatî gelê Êlihê çareseriyê bîne. Ji ber ku me soz daye Sakine, Mazlum, Xeyriyan. Me soz daye Orhan Dogan, Vedat Aydinan.
Em bang li kesên bê biryar dikin ku dem hindik maye û bi kez biryara xwe bidin. An ji bo ronîbûnê, an jî ji bo taribûnê bijartina xwe bikin. An ji bo mazluman an jî ji bo zilmê bijartina xwe bikin. Lê em bawer in ku hûn dê ji bo aştî, ronahiyê hilbijartina xwe bikin. Em destûr nadin li vî welatî ne leşker û ne jî gerîlayek jiyanaxwe ji dest bidin. Em destûr nadin darbest bên vî welatî. Em destûr nadin li vî welatî ciwan jiyanaxwe ji dest bidin.
Em ê kefa wan di qirika wan de bihêlin. Em dê Birêz Selaheddîn Demîrtaş bikin Serokomar. Ji ber vê yekê dengek ji bo HDP'ê û dengek ji bo Demîrtaş. Ji bo siberoja ronak û azad em tev bigerin. An azadî an azadî."

## Bêdengiya li tecrîdê sûcê mirovahiyê ye

TAJÊ têkildarî tecrîda giran a li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan daxuyanî da. Di daxuyaniyê da hat diyarkirin ku divê ji bo demokrasî û azadiyê, Ocalan serbest bê berdan.
Tevgera Azadiya Jinên Êzidî (TAJÊ) têkildarî tecrîda giran a li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan li Şengalê daxuyanî da. Daxuyanî ji aliyê Endama Rêveberiya Mamosteyan a Şengalê Sebîha Sebrî ve hat xwendin. Di daxuyaniyê de hat ragihandin ku tecrîda giran a li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ne hiqûqî ye û divê demildest bê rakirin.Di daxuyaniyê de hat gotin ku Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ji mafên xwe yên rewa bêpar tê hiştin û rêxistinên mafên mirovan ên navneteweyî jî li dijî vê yekê bêdeng dimînin. Her wiha hat gotin ku bêdengiya rêxistinên mafên mirovan jî sûcê mirovatiyê ye û divê ev bêdengî jî demildest bi dawî bibe…***JINNEWS***



# Pêkane AKP di 24'ê hezîranê de têk biçe

***Hevserokê Konseya Rêveber a KCK'ê Cemîl Bayik diyar kir ku pêkan buye AKP di 24'ê hezîrnaê de têk biçe. Bayik wiha got, "AKP ketiye nava pêvajoyeke têk çûnê. Lê belê AKP naxwaze bi hilbijartinê dest ji desthilatdariyê berde. Mirovên ku dixwazin ji AKP'ê rizgar bibin hê bi biryar xuya dikin. Ger ev hêz li sandoqan xwedî derkevin mirov dikare bêje ku wê dawî li desthilatiya AKP'ê were."***

Hevserokê Konseya Rêveber a KCK'ê Cemîl Bayik got, "Xuya ye mirovên dixwazin ji AKP'ê rizgar bibin hîn bi biryar in. Eger ev hêz hîn baştir bixebitin û xwedî li sindoqan derkevin, mirov dikarin bêjin ku dawî li desthilatdariya AKP'ê tê."



Hevserokê Konseya Rêveber a KCK'ê Cemîl Bayik li ser hilbijartinên 24'ê Hezîranê, rewşa AKP'ê û hêzên demokrasiyê ji rojnameya Yenî Ozgur Polîtîka re axivî.

Bayik da xuyakirin ku îdîa û daxuyaniyên AKP'ê yên dema destpêka desthilatdariya xwe û yên niha ji hev cuda ne, nakok in û got, ji ber vê yekê di vê hilbijartinê de tengav bûye.

Bayik destnîşan kir ku di vê hilbijartinê de îhtimal heye ku desthilatdariya AKP'ê têk biçe û got: "Ev yek jî di gotin û daxuyaniyên Erdogan û AKP'ê de eşkere dibe. Piştî ku dît wê têk biçe, zext û zordarî zêde kir. Bi girankirina zexta li ser her kesî û bi neheqiya şert û mercên hilbijartinê re dixwaze di hilbijartinê de bi ser bikeve. Desthilatdariya AKP'ê ji bo şovenîzmê sor bike dest bi dagirkirina Efrînê kir, lê tê dîtin ku vê yekê jî zêde deng nedaye wê. Ev jî vê rastiyê nîşan dide: Eşkere ye ku di nava civaka Tirkiyê de hêrs û nerazîbûn heye. AKP'ê şovenîzmê çiqasî sor bike bila bike nikare nêrîna civakê ya li AKP'ê biguhere."

Bayik destnîşan kir ku ihtimal çêbûye ku AKP ji desthilatdariyê bikeve û wiha dewam kir: "Atmosfera hilbijartinê dibe ku weke ya hilbijartinên bihurî zêde zindî nîne. Ji ber ku AKP gelekî zextê dike û hemû çapemenî bi dest xistiye. Çapemenî ji bilî Erdogan û AKP'ê cih nade kesî. Ji ber vê yekê atmosfera hilbijartinê tenê bi axaftinên Erdogan nîşan didin. Lê tê dîtin ku axaftinên Erdogan ên li mîtîngan mîna berê bandorê li civakê nakin. Ev rastî hemû nîşan didin ku cara yekê ye pêkan bûye ku AKP di 24'ê Hezîranê de têk biçe."

Cemîl Bayik diyar kir ku AKP hewl dide bi zext û hîleyê vê rewşê biguherîne û got, "Eger hêzên demokrasiyê, hêzên mûxalîf, Kurd û hemû hêzên ji desthilatdariya AKP'ê aciz in xwedî li sindoqan derkevin, pêşî li fenan bigirin û bi rêjeyeke xurt HDP'ê di ser bendê re bixin, wê dawî li AKP'ê were."

Bayik anî ziman ku desthilatdariyek nema dikare ji ciwanan dengan bigire û ji ciwanan dûr dikeve, şensê xwe nîne ku di hilbijartinê de bi ser bikeve û got, "AKP ketiye nava pêvajoyeke wiha. Lê belê AKP naxwaze bi hilbijartinê dest ji desthilatdariyê berde. Sekna xwe ya niha bi vî rengî ye, hilbijartinê weke pirsgirêka paşerojê dibîne. Bi têgihiştina 'Eger AKP winda bike wê Tirkiye winda bike' hewl dide civakê bixapîne. Ji vî alî ve bêguman wê hilbijartineke zehmet be. Lê tê dîtin ku gel xwe ji AKP'ê vedigire. Mirovên dixwazin ji AKP'ê rizgar bibin hîn bi biryar xuya dikin. Eger ev hêz hîn bêhtir bixebitin û xwedî li sindoqan derkevin, mirov dikarin bêjin ku dawî li desthilatdariya AKP'ê tê. Li pêşberî civakê wê biqede. Ya rast di refernadûma 16'ê Nîsanê de jî têk çûbû. Bi ihtimaleke mezin wê di vê hilbijartinê de jî têk biçe."

## Ji bo azadiya Ocalan wê nobedê bigirin

Hevserokên KCDK-E'yê û hemû komeleyên bin banê wê 25'ê Hezîranê wê tevlî çalakiya nobetê ya 'Ji Ocalan re azadî' ya li Strasboûrgê bibin.

Dîwana Hevseroktiyê ya Kongreya Civaka Demokratîk a Kurdistaniyên li Ewropayê (KCDK-E) bi daxuyaniyeke nivîskî bi bîr xist ku çalakiya nobedê ya ji bo azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan li bajarê Strasboûrgê ya Fransayê pêk tê, 25'ê Hezîranê wê 6 salan li pey xwe bihêle.

Çalakiya nobedê ya 'Ji Ocalan re azadî', ji 25'ê Hezîrana 2012'an ve li qada ku Konseya Ewropa, Dadgeha Mafê Mirovan a Ewropayê, Komîteya Pêşîlêgirtina Êşkenceyê û Parlamentoya Ewropayê tê kirin. KCDK-E'yê bi bîr xist ku heta niha li Ewropayê gelek kes, sazî û komên civakî yên cuda yên Kurdistanî, Tirkiyeyî, Asûrî, Elewî, Êzîdî û Ewropî, siyasetmedar, sendîkavan û şaredar tevlî çalakiyan nobedê bûne. Di daxuyaniyê de hate gotin, taybetmendiya çalakiyê ew e ku bi demekê ne sînordar e, hefteyê heft rojan bênavber didome û ev jî nîşana wê ye ku ji daxwaza 'ji Ocalan re azadî' yek gav jî bi paş de nayê avêtin. KCDK-E destnîşan kir ku çalakî heta azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan wê bidome.

Di dewama daxuyaniyê de hate hate ragihandin ku ku pêvajoya berdest ji bo têkoşîna dijî tecrîda li ser Ocalan û ji bo pêkanîna azadiya Ocalan pir girîng e û got, "Rabûna li ber tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan peywireke exlaq, însan û wijdên e."

KCDK-E'yê li ser tevlêbûna xwe ya li çalakiya nobetê got, "Ji bo têkoşîna dijî tecrîda li ser Rêber Apo û azadkirinê, ku em vê hem ji peywireke exlaqê û wijdanê dibînin û biryara Kongreya me ya 2'yan e, di salvegera çalakiya nobetê de, ya 'ji Ocalan re azadî' ya li Strasboûrgê, 25'ê Hezîranê hevserokên KCDK-E'yê, hevserokên hemû hemû sazî û dezgên bin banê wê yên li hemû welatan, nûnerên jin û ciwanan em ê nobeta 'Ji Ocalan re azadî' dewr bistînin."

KCDK-E'yê bi domdarî diyar kir ku divê çalakiya nobetê ya 'Ji Ocalan re azadî' bi rengekî geştir û berfirehtir were domandin û bang li gelê Kurd û dostê Kurdan kir ku tevlî çalakiya 'Ji Ocalan re azadî' bibin.

KCDK-E'yê diyar kir nobeda wan wê hefteyekê bidome û wiha bang kir: "Em Bang li gelê xwe yê Ewropa, dostên xwe, bang li şoreşger, demokrat, rewşenbîr, Ermen, Sûryan, Kurd, Tirk, Laz, Çerkezan dikin ku bi rengekî geş tevlî çalakiye bibin."

## Erdogan ji bo hemû rojhilatanavîn xeter e



Salih Gedo diyar kir ku dewleta tirk a dagirker li bakur û başûrê Kurdistanê êrîşî vîna gelê Kurd dike, gefan li rojavayê Kurdistanê dike û got, "Li dijî wan êrîşan pêwîst e dewletên navneteweyî êdî ji Erdogan re bibêjin bese."

Sekrêterê Partiya Çepgir a Kurd Salih Gedo derbarê êrîş û tehdîtên dewleta tirk de ji ANHA'yê re axivî û destnîşan kir ku Erdogan ji bo Rojhilata Navîn jî xetere û pêwîst e hemû hêz li dijî dîktatoriya Erdogan rawestin.

Salih Gedo bal kişand ser êrîşên dewleta Tirk ên li ser axa başûrê Kurdistanê û wiha got: "Dewleta Tirk a dagiker êrîşên xwe li ser axa Kurdistanê xurt kirine. Armanca wan deskeftî û şikandina vîna gelê kurd e. Êrîşên li ser başûrê Kurdistanê diyar dike ku Erdogan dixwaze di hilbijartinên 24 Hezîranê de bi ser bikeve. Bêguman projeya hikumeta AKP'ê derbarê vegerandina Dewleta Osmanî de jî heye. Li dijî êrîşên li ser başûrê Kurdistanê bêdengiya dewletên navneteweyî berdewam dike. Pêwîst e dewleta Iraqê li dijî dagirkeriya dewleta Tirk ya li dijî axa Iraqê bisekine."


Salih Gedo li ser bêdengiya dewletên navnetewî wiha got, "Ev bedengiya dewletên navnetewî li dijî êrîşên dagirkeriya dewleta tirk diyar dike ku di nava planê de ne.Çawa li Efrînê de li hev kirin û li hember êrîşên hovanê bedeng bûn li Başûrê Kurdistanê jî bê deng dimînin. Heke dewletên navnetewî bêdengiya xwe li êrîşên dagirkeriya dewleta tirk li ser Minbic, Efrîn û başûrê Kurdistanê berdewam bikin wê li Rojhilatanavîn rê li pêşiya pisgirekên nû vebin. "

Gedo wiha dewam kir: "Beriya êrîşên li ser Efrînê Erdogan di nava êrîşên li ser Kerkûkê de cih girt. Niha jî dixwazin hemû axa başûrê Kurdistanê dagir bikin. Ev hemû êrîş bi hev ve giredayî ne û yek armanca wan heye ku şikandina vîna gelê kurd e. "

Salih Gedo diyar kir ku di hilbijartinên 24'ê Hezîranê de têkçûna Erdogan wê ji bo hemû gelan taybet gelên Rojhilata Navîn bibe nefesek û wiha got, "Dîktatorî û rejîma faşîst dê li pêşiya îrade û yêkitiya gelan têk here. Di nav gelê li Tirkiyê de jî hêdî hêdî dengekî serhildanê derdikeve. Ji ber ku êdî ew jî dîktatoriya Erdogan qebûl nakin. Beşeke mezin a gelê Tirkiyê ji faşîzma Erdogan re dibêje na. Em bawer in ku Erdogan wê têk biçe û gelê kurd û yên gelên Rojhilata Navîn nefesekê bistînin."

## Dengê xwe bidin HDP'ê, bi derewên Erdogan neyên xapandin





Rûspiyên êl û eşîrên Kurdan ên kantona Kobanê bang li gelê Kurd û hêzên azadîxwaz ên Bakurê Kurdistanê û Tirkiyê kirin ku di hilbijartinên 24'ê hizêranê de dengên xwe bidin Partiya Gelan a Demokratîk HDP'ê û bi derewên Erdogan neyên xapandin.

Derbarê hilbijarinên 24'ê Hizêranê yên li Tirkiye û bakurê Kurdistanê de, rûspiyên êl û eşîrên Kurdan ên kantona Kobanê bang li gelê Kurd ê hêzên demokartîk kirin ku dengê xwe bidin HDP'ê.

Rûspiyê eşîra Kêtikan a Kobanê Muslim Hesen wiha got: "Divê gelê Kurd li Bakurê Kurdistanê îradeya xwe di 24'ê Hizêran de hilbijêre û divê gelê me li hemberî komployên li dijî wê tên meşandin haydar be. Dîroka hikûmeta Tirkiyê bi komkujî û tunekirina gelê Kurd dagirtî ye û herî dawî dagirkirina bajarê aştiyê Efrînê li ber çavên her kesî ye."

Hesen bang li gelê Kurd li Bakurê Kurdistanê kir ku di hilbijartinan de bi daxuyaniyên Erdogan neyên xapandin û got: "Siyasetên Erdogan ên dijberiya gelê Kurd eşkere ne û nîşana vê yekê jî ew e ku nûnerê gelê Kurd yê HDP'ê Selaheddîn Demîrtaş hê jî digirtîgehê de ye."

Rûspiyê eşîra Bîcan li kantona Kobanê û endamê Komîteya Lihevanînê ya bilind li herêma Firatê Bozan Muxtar jî diyar kir ku Erdogan hewl dide di van hilbijartinan de bi serkeve û diktatoriya xwe hê kûrtir bike.

Muxtar destnîşan kir Tirkiye di nava qeyraneke mezin de bû û Erdogan jî li ber têk çûnê bû lewra jî biryara hilbijartina pêşwext girt ku desthilatiya xwe li ser lingan bigire.

Rûspiyê eşîra Bîcan bang li gelê Kurd û hemû pêkhateyên azadîxwaz û demokrasîxwaz ên li Bakurê Kurdistanê û Tirkiyê kir ku di hilbijartinên 24'ê Hizêranê de dengên xwe bidin HDP'ê…

*ANHA*



# Gel li dijî çeteyan daket qadan

***Gelê Efrînê li dijî kiryarên hovane yên leşkerên Tirk û çeteyên wê bêzar buye. Çeteyên dewleta Tirk yên bi navê OSO'yê li Efrînê bijîşkek qetil kirin. Gelê Efrînê li hember vê yekê daketin qadan û bi duruşmeyên "em çeteyên qatil naxwazin" li dijî çeteyan nerazîbûna xwe anîn ziman.***



Çeteyên dewelta Tirk yên bi navê OSO'yê li Efrînê bijîşkek qetil kirin. Şêniyên bajêr daketin kolanan û nerazîbûna xwe anîn ziman. Çeteyan careke din jî êrîş kirin û jinekê jiyana xwe ji dest da.

Ji ber sûcên ku dewleta Tirk û çeteyên wê li Efrînê dikin gel dadikevin qadan. Çeteyên OSO'yê roja Çarşemê xwest bijîşkê bi navê Samî El Ferec ji mala wî derxîne. Bijîşkê ku ev tişt qebûl nekir, ji aliyê çeteyan ve hate qetilkirin. Ev înfaz di nava demeke kurt de li Efrînê hate bihîstin. Şêniyên Efrînê yên ku hatin ber mala bijîşk, nerazîbûn nîşanî çeteyan dan.

Şêniyên bajêr bi slogana 'Em çeteyên qatil naxwazin' cenazeyê bijîşk ji mala wî derxistin û dest bi meşê kirin. Çeteyan bi çekan êrîşî girseyê kirin, li vê derê jinekê jiyana xwe ji dest da, gelek kes jî birîndar bûn. Ligel ku êrîş hate kirin ku girseyê kolan neterikand û çete ji neçarî ji navenda bajêr dûr ketin.

Dewleta Tirk li herêmê tevî çeteyan şerekî sîstematîk dike. Tirkiyê di 20'ê Çileyê de dest bi êrîşên xwe kir. Di 18'ê Adarê de jî çete ketin nava bajêr. Ji dema ku êrîş hatine destpêkirin, bi sedan sivîl hatin qetilkirin, bi sedan sivîl jî hatin revandin. Mal û milk û dikanên sivîlan hatin talankirin. Gelek cihên dîrokî hatin rûxandin, her roj nûçeyên êşkenceyê tên. Rêxistina Şopandina Mafê Mirovan HRW'ê jî di demeke nêzik de raporek weşand û diyar kir ku komên ku Tirkiye piştgiriya wan dikin li Efrînê mal û milkên Kurdan talan dikin.

## Gelê Babê bang li QSD`ê dike



Gelê Babê ku ji ber kiryarên komên çete yên girêdayê dewleta tirk bêzar bûne, bang li QSD'ê kirin û anîn ziman ku di navbêra komên çeteyan de pêvçûn derdikevin lê yê zirar dibîne niştecih bixwe ne. Welatiyan destnîşan kir ku rayedarên dewleta tirk ligel van tiştan dizane jî dengê xwe nakin ji bo niştecih banga mudaxelekirinê bikin.

Li gor nuçeya ku malpera navenda lekolinên stratejîk a kurdistanê ku derbaskiriye, gelê Babê ji ber kiryarên komên çete yên girêdayê dewleta tirk ên wekî revandin, dizî, talanî û îşkencekirin, bêzar bûne. Li ser vê yekê gelê Babê ji bo wan ji van kiryaran rizgar bikin bang li hêzên QSD'ê dikin.

Hat diyarkirin ku roj namîne komên çete yên di bin banê dewleta tirk de li Babê bicih bûne, li ser talanî, dizî û her wiha hakimiyeta qadê pêvçûn dernekeve. Hat destnîşankirin ku ji bilî van talanî, dizî, revandina mirovan û xwestina fidyeyê ji malbatan, niştecihên bajêr bêzar bûne. Hat ragihandin ku di navbêra komên çeteyan de pêvçûn derdikevin û sedema wê jî li ser xenîmeta talaniyê ye.

Ji niştecihên Babê yê bi nave Ehmed Osman, li ser mijarê de axivî û derbarê kiryarên çeteyan de agahiyên balkêş da. Osman, diyar kir ku di nava du mehên dawî de 9 caran pêvçûn di navbêra komên çeteyan de qewimine û wiha got: "Destpêkê kiryarên dizî, talanî, revandina mirovan û xwestina fidyeyê ya ji malbatan pêk tînin û piştre jî li ser van xenîmetên talaniyê li hev dikevin. Ev li hevketin dibe pêvçûn û sivîlan dikin qurbanî. Em dikarin bêjin ku tenê di nava du mehên dawî de 9 bûyer qewimîne û di encamê de jî 15 sivîl hatine qetilkirin. Ji van kesan 3 ji wan jinin û 4 jê jî zarok in. Çend roj berê di navbêra Ehrar El-Şerqiye û malbata Al Wakî de pêvçûn derketibû û di vê pêvçûnê de jî 4 kesên ji malbatê hatin kûştin. Sedema pêvçûnê jî li gorî em dizanin li ser revandin û kiryarê bêexleqî bû."

Welatiyeke din yê bi navê Mihemed Esfûr jî, agahiyên ku Ehmed Osman piştrast kir û anî ziman ku gelê Babê ji kiryarên van çeteyan bêzar bûne.Esfûr, diyar kir ku haya rayedarên dewleta tirk ên di Babê de ji van kiryaran heye û heta hin caran ew teşwîq jî dikin. Esfûr, anî ziman ku, lê gelê Babê êdî baş dizane ku ev lîstikeke dewleta tirk bixwe ye.Esfûr, li ser vê yekê bang li şervanên QSD'ê kir û wiha got: "Em baş dizanin ku şervanên QSD'ê zarokên vî welatî ne, dizî, talanî, îşkence û kiryarên bêexleqî li cem wan tuneye. Ji bo vê jî hemû niştecihên Babê heremên ku QSD'ê rizgar kiriye çewa radestê niştecihên wê bajarî kiriye, em jî dixwazin ku bajarê qedîm Babê ji van çeteyên hov rizgar bike û radestê gelê Babê bike."

## Dewleta Tirk dijminê Kurdan e

Nivîskar Letîf Fatîh Ferec diyar kir ku dewleta Tirk ji berê ve dijminahiya Kurdan dike û got, "Tevî vê bê edebiyê jî hinek Kurd ji Erdogan bawer dikin. Erdogan bê rêziyê li mirov, xweza û zindewarên Kurdistanê dike."



Dagirkeriya dewleta Tirk a li ser Başûrê Kurdistanê û gefên li dijî Qendîlê dibe sedema nerazîbûna hemû pêkhate û gelê Başûrê Kurdistanê. Nivîskar û rojnameger Letîf Fatîh Ferec li ser gefên Tirkiyê ya li dijî axivî û diyar kir ku Qendîl ne gundek biçûke ku hema Tirkiye bikevê.

Latîf got; "Qendîl ji dîroka xwe ya kevnar heya niha ve azade. Lê çeteyên Tirk bêrêziyê li hember xwezaya Qendîl dikin. Daran dişewitînin, lawiran dikujin û xwezayê xira dikin."

Nivîskar Latîf diyarkir ku leşkerên Tirk bi rehetî nikarin li Colemêrg, Dêrsim û bajarên din yên Bakûrê Kurdistanê jî bigerin û wiha dewam kir; "Leşkerên Tirk nikarin bi xwesteka xwe li hinek bajarên Bakûrê Kurdistanê jî tev bigere. Heya vê kêliyê jî, Kurd aştî û azadiyê dixwazin. Kurd peyama bihevre jiyankirinê didin."

Nivîskar Letîf di dawiyê de kişand ser dîroka dagirkeriyê ya dewleta Tirk û got; "Di dîrokê de her tim dewleta Tirk dijminahiya Kurdan kiriye. Her tim Tirkiye li hember mafê Kurdan bûye asteng. Lê hertim Kurdan li hemberî vê yekê jî peyama aştî û jiyana bi hev re daye."…***ROJNEWS***

## Divê Erdogan tercîha gel qebûl bike



Berdevkê HDP'ê Ayhan Bîlgen li Qersê bang li serokê rêjîma tirk Erdogan kir û got, "Divê Serokkomar bi rengekî vekirî eşkere bike ku ew ê tercîha gel qebûl bike."

Berdevkê HDP'ê Ayhan Bîlgen li Qersê civîneke çapemeniyê li dar xist û rojeva heyî nirxand.

Bîlgen got, "3 roj man e ji bo dengdanê. Di rewşa heyî de ewlekariya hilbijartinê wê bibe îmtihana herî girîng a ji bo demokrasiyê."

Bîlgen ji bo hurmet ji tercîha dengdêran re bê nîşandan bang kir û got, "Berpirsyariya hemû partiyan û burokrasiyê ye, ku vê îmtihanê bi rengekî erênî bi ser bixin. Li welatekî tercîha mirovan dikare biguhere. Gel dikare siyasetmedarê ku berê qebûl kiribû vê carê qebûl neke. Wezîfeya siyasetmedaran e ku gel tercîha çi kiribe, hurmetê nîşanî wê bide. Divê beriya dengdanê eşkere bike ku wê hurmetê nîşanî tercîha gel bide."

Bîlgen bang li Erdogan kir û got, "Pêwîste Serokkomar bi awayekî vekirî eşkere bike ku wê tercîha hilbijêran qebûl bike. Nêzîkatiyeke berevajî vê yekê wê bibe bingeh ji bo rûdana bûyerên neyînî di roja hilbijartinê de."

Bîlgen destnîşan kir ku desthilatdarî çawa bi hilbijartinê hatiye, divê li xwe qebûl bike ku bi hilbijartinê dikare biçe.

Bîlgen ji bo mûxalefetê jî got, "divê mûxalefet eşkere bike ku wê erkên sîstema yek şexsî bi kar nîne."

## Li Sûriyê çareserî bi dawîanîna dagirkeriyê pêkan e



**Mihemed SEYDÎ**

Çend sal derbas dibin û hîne jî behse çareseriyê li Sûriyê dikin. Lê ya li ser erdê ji bilî qetilkirin, wêrankirin, talankirinê û koçberkirinê çi bûye. Ji bajarên sûriyê bi hezaran kes penaber bûn, bê cih û war hatine hiştin û hîne jî li çareseriyê çareseriyê 'digerin'.

Cenêv hatin lidarxistin û hîne jî tên lidarxistin. Encam çiye û çi derketiye? Tenê Komîte û lijneyên demderbaskirinê hatin avakirin, şande diçin û tên. Li aliyê din jî astana û li hevkirina li ser Sûriyê li gorî berjiwendiyên garantorên van civînan pêk tên Erê; rewş wiha ye. Lê li civînan gelê Sûriyê û nûnerên wan ne amade ne û dibêjin wê çareseriyê û aştî û aramiyê ji bo Sûriyan bînin. Li nava axa sûriyê li ser erdê jî nahêlin li hevkirin pêk were. Ger ku em bibêjin çareserî jî heye wê ew yek dest pêkê bi derxistina dagirkeriya dewleta Tirk ji nava axa sûriyê be. Kî li dijî vê dagirkeriyê be di rastiya wan de çareserî wê were dîtin û tê dîtin. Ji bilî Hêzên bakurê Sûriyê jî niha kî amadeye ku li dijî dagirkeriya dewleta Tirk şer bike û serweriya axa sûriyê biparêze û ji bo wê di nava tevgerê de..

Yên din ku qale serweriya axa sûriyê û parastina wê tenê bi ziman dike jî rêjîme. Ev rêjîma em bala xwe didinê ku serweriya wê heta li ser wê jî nemaye ji bilî zimanê di devê wê de ku derdikeve û daxuyaniyan dide tiştek tune. Lê li pişt wê kî heye diyare.dîsa jî ger ew di vê mijarê de dirûst be gavekî baş û erênî ye.

Ji bo serweriya axa sûriyê were parastin gelek caran banga ji bo diyalogê ji aliyê Meclisa Sûriya Demokratî MSD û nûnerên bakurê Sûriyê ve hate kirin û heta niha jî bang ji bo wê têne kirin. Tevî ku di demên dawî de qale hin danûstandinan tê kirin jî lê bêyî şerê li dijî dagirkeirya dewleta Tirk wê çi çareserî bi diyalogê jî çê nebe. Raste ku nûnerên bakurê Sûriyê gotin ku ji bo danûstandinana ew ti şertên pêşwext danayînin lê ev ji wê zêdetir parastina rûmeta Gelên li Sûriyê ye ku wê gava destpêkê ji bo çareseriyekê bibe. Ger dagirkerî neyê derxistin, bibe nebe wê axa Sûriyê were parçekirin û devera dagirkirî û li wir guhertina demografîk pêk tê û didome wê bibe hêlîna Çeteyên ku dewleta Tirik li vir kom kirin û ne diyare sibê berê wan çeteyan bidin ku derê. Gelo ger ev komên çete yên ku dewleta Tirk serkêşiya wan dikin neyên tunekirin wê dagirkerî çawa biqede. Ger hin alî dibêjin bira ew komên ku navê wê opozisyone( opozisyona Tirk) jî di nava çareseriyê de cihê xwe bigrin û dixwazin wan jî beşdarî civînên wekî li Astana û hwd bikin wê dîsa jî çareserî pêkanbe gelo? Na, ne xêr, nabe. Ji ber destê van di talankirin û wêrankirin cih û warê gelê Sûriyê de heye. Raste belkî hêjamrek ji wan hemwelatiyên sûriyê ne, lê niha çeteyên dewleta Tirkin û ne mûmkune ku gelên sûriyê wan qebûl bike.Ji ber van sedeman jî ger civîn û danûstandinên ku di destpêka wê de dagirkeriya dewleta Tirk û derxistina wê û çeteyên wê ji nava axa Sûriyê nebe, çareserî jî ne mimkune.